

Yek ji berhemên Ararat Groupê ye.  
Qamişlo-Rojavayê Kurdistanê.  
Kovareka demsalî ye-Sala yekê.

03  
15'ê gulana 2022'ê

# ARA ZAROK





Kovareka perwerdeyî,  
zanistî û çandî ya zarakan e.  
Yek jî berhemên Ararat Groupê ye.

Silav hevalên min!

Ara Zarok: mala we ye, warê hêvî û xewnan e.  
Kovara me rêya zanist, perwerde û çanda kurdî ye.  
Pencereya cîhana zarakan e.  
Hem dibistan, hem jî xemrevîna we ye!

Em ê bixêrhatina bîharê bîkin û wexta gul bibîşkîvin;  
wê himêz bîkin û pê xemrevîn bibin.  
Em ê li bênderan bilîzin û bibin hevrûyên xweristê.  
Xecxecok û şîlîrêñ îsal, hêvîyên dilên me dirêsin!



- Birêveberîya kovarê: Sîlêman Osman
- Sernivîser û Sererastker: Raman Hesê
- Nîgar: Nêçîrvan Ehmed
- Dîzayin: Hesan Mihemed  
Mihemed Osman

Ara Zarok: çêja jîgîna zarokê Kurdan e!

Ara Zarok



ARARAT GROUP

[www.araratgroup.info](http://www.araratgroup.info)

©Hemû maf parastî ne.  
[www.arasat.online/zarok](http://www.arasat.online/zarok)



Babilîtan (Babûtan)



06

Sudoku  
Çavbaz

Lîstok

10

08

Ku  
Kurmancî

04

Sirûd

Aram Gernas  
**Demsal**



Şar  
Efrîn  
“Çiyayê Kurmênc”

Çirok  
Rovîyê Şêr

12

EN  
English



18

22

Ku  
Zazakî

Mamik  
Zûgotinok  
Gotinên Pêşyan

24





Kanûn, çile û sibat  
Demsala zivistan hat  
Berfê spî kir axê  
Serma bi ser me da hat

# Den



Adar, nîsan û gulan  
Bihar li deşt û çîyan  
Gul û nêrgiz û çîçek  
Vedijenînin jîyan

Hezîran, tîrmeh û tebax  
Havîn e germ dibe ax  
Zer dibe ceh û genim  
Mişmiş sor bûne li şax



# nsal

Aram Gernas

Îlon, cotmeh û çirî  
Payîz e ba dike vîzin  
Diweşin pelên daran  
Reş dibe esmanê şîn.

# Babilîtan (Babûtan)

Em lîstika "Babilîtan" biharan dilîzin.

Em xwe didin hev û diçin bênderan, li nav gul û kulîlikan kom dîbin û dilîzin.

Her kes bi dora xwe; em bi rêzê li kêleka hev disekeinin û xwe daqûl dîkin,  
destêن xwe datînin li ser çogêن xwe û serêن xwe dadixin.

Ê/a ku pêşî dest bi lîstikê dike; xwe di ser me ra çem dike (diçevêze) û em jî  
yekoyeko didin pey û vê sirûdê dibêjin:

"Babilîtan xweş Babilîtan e  
'Aşiqê çirîk û çîyan e  
Devreşîk ji devê guran e  
Devreşîk ji wê ve xuya ne  
Du pîran dew dîkilane  
Min jî wan xwest û nedane  
Dew hebû, ji qazî ve nedane  
Du teştên tîje hevîr in  
Du benêن tîje hejîr in  
Du kîsîkêن tîje mewîj in  
Du selikêن tîje guhîj in  
Du kûpêن tîje penîr in  
Ser tîjî jajî û sîr in  
Dar ji dara dirêjo  
Şax û paxan diavêjo  
Gayê Şemo qîro  
Wê li der mala mîro  
Jin helalê mîro."

Heger em di sirûdê da şas bibin, an jî devereka me bigihe laşê hevalên me,  
em dişewitin û li cihê em lê xwe daqûl dîkin û rê didin ên di pişt xwe ra.

Wiha her yek jî me carek û du car û sê car xwe çem dîke û dîlîze.

Heya em newestin; em dev jî lîstîka xwe bernadin û koma xwe jev belav nakin.

Dema ez diçim Kobanîyê; ez vê lîstikê bi hevalên xwe yên kobanî ra dîlîzim,

lê ez sirûda herêma wan wiha dibêjim:

“Babûtan xweş babûtan  
Salekê duduyan çûm çîyan  
Vegeriyam ketime çîyan  
Ana pîrê lexmek rûn  
Lexmek rûn bi diwazde hêkan.”






# KURMANÇÎ

Silav!

Nivîsandina tîpan bi awayê rast, bingeha fêrbûna zimên e.

**De ka em bi hev ra van xalêñ li jêr bigihînin dawîyê.**





# SuDoku

Sudokuya vê carê xweş û hêsan e.

Rahêje qelema xwe û ka em pev ra dest pê bikin.

						9	2	6
2	6		9	1		5	4	
	5	4	6	3				
6			8		5		9	7
8								1
5	4		1		9			2
7				2		1	6	
		2		9	6		3	5
3	8	6						



Çavêñ te êdî bûne weke agir.  
Ka em dest bi vê lîstika nû bikin.



JÎIB IKRNSTUDA

ÎSÛYAR

QÎAR


RAÎN

UYRÎTKA



# Rovîyê Şêr

Hebû fine bû.  
Şerek hebû.



Rojekê ji rojan, şêr xwe lî bin siha darekê vezîlandibû. Dît ku wa ye rovîyek bi alîyê wî ve tê, lê rovîyekê jar, belengaz û pirçweşiyayî bû. Şêr jê pirsî: "Rovî! Ma te xêr e? Çima wiño belengazî û pirça te weşîyaye?"

Rovî got: "Hoy serwerê tebayan! Ev sala han dijwar bi ser min da hat û ez wiño şepirze kirime."

Şêr got: "Ê bira ka were ez te têr bikim. Tu dîbêjî ci?"

Rovî got: "Ma tiştek ji vê xweş û çêtir heye ku ez vê sala xerab têr goşt bibim!"

Şêr got: "Binihêre; ez ci pirsê ji te bikim, tu yê vê bersivê bidî min!"

Rovî got: "Baş e! Ez amade me ezbenî."

Şêr got: "Çavêن min çawa ne?"

Rovî got: "Çavên te çavên şêran in."

Şêr got: "Pirça min çawa ye?"

Rovî got: "Mûyên sînga te weke pîjan tûj in."

Şêr got: "Serê min çawa ye?"

Rovî got: "Serê te serê qehremanan e."

Şêr got: "Lepêن min çawa ne?"

Rovî got: "Lepêن te lepêن şêran in."

Şêr got: "De rabe bîlezîne bide pey min."



Rovî da pey şêr, çûn çûn, gihane mîrgekê weki  
mîrga Merîwanê.

Mîrg mişt hesp û hêstir bû.

Şêr bergilek jî yên qelew raçav kir û lepek lê da,  
da dest rovî û got: "Ha ji te ra. Têr bixwe.

Hema rabe bixwe û rûne bixwe!

Her ci cara ku tu birçî bibî, bi ser min da were."



Rovî jî kete ser goşti û têra xwe xwar. Rojek, du, sê, heta ku zîkê rovî  
nepixî, gir û qelew bû û çavên wî sor bûn.

Rojekê dît ku va ye rovîyek ber bi wî de tê. Çaxê ew birçî, jar û reben  
bû hate bîra wî. Ji meşa rovîyê din fêm kir ku ew jê jî belengaztir e.

Çaxê giha ber, jê ra got: "Bira! Tu çîma wîlo belengaz i?"

Rovîyê jar jê ra got: "Bira ma tu nizanî îsal sala xelayê ye?!"



Rovîyê çavşor jê ra got: "Kuro! Guhê xwe xweşik bide min. Ci pirsa ku ez ji te bikim, tu yê li min vegeŕinî, ku te kir; ez ê zikê te têr goşt bikim!"

Rovîyê jar got: "Bila ezbenî!"

Rovîyê çavşor got: "Çavêن min çawa ne?"

Rovîyê jar got: "Çavêن te; çavêن rovîyan in!"

Rovîyê çavşor got: "Na bira, na!"

Wilo mebêje heyrana çavên te."

Rovîyê jar lê vegeŕand û got: "Nexwe ci bibêjim bira?!"

Rovîyê çavşor rabû ew tiştên ku şêr jê ra gotibûn, hemû fêrî rovîyê jar kir û got: "Ha tu yê bi vî awayî bersivê bidî."

Rovîyê jar got: "Baş e ezbenî."

Wextek derbas bû, her duyan berê xwe dan nêçîrê.



Rovîyê çavşor berê xwe da rovîyê jar û axivî.

Rovîyê çavşor got: "Çavêن min çawa ne?"

Rovîyê jar got: "Çavêن te çavêن şêran in."

Rovîyê çavşor got: "Pûrıta min çawa ye?"

Rovîyê jar got: "Mûyên sînga te weke pîjan tûj in."



Rovîyê çavşor got: "Serê min çawa ye?"  
Rovîyê jar got: "Serê te; serê qehremanan e."  
Rovîyê çavşor got: "Lepêñ min çawa ne?"  
Rovîyê jar got: "Lepêñ te lepêñ şêran in."  
Rovîyê çavşor got: "De rabe bilezîne bide pey min!"



Rovîyê jar da pey rovîyê çavşor, çûn çûn, gîhane mîrgekê. Rovîyê çavşor bergîlek ji yêñ qelew raçav kir, xwe çengî paşîya wî kir û lepek lê da. Wî got qey ew jî weke şêr wê bergîl biavêje erdê. Lê ne wilo der ket!


Bergîlî hema pehînek li nav çavêñ rovî da, ew li erdê dîrêj kir. Rovîyê jar tîrsîya, xwe bi dûr xist û got: "Birayê xweşewîst! Min dizanî ku tu ne şêr î, lê te xwe li ber çavêñ min dîkire şêr. Min jî bi hêvîya çenîyek goşt, digot belê!"







Hi there, let's do some pre-writing before we trace the capital and small letters.

Always start at the dot.



Some letters are lowercase and others are UPPERCASE.





DID YOU KNOW? A quick brown fox jumps over the lazy dog.

DID YOU KNOW? This sentence (pangram) has all 26 letters of the English alphabet!





Ji devê: Ebdelah Qereman

Efrîn; bajarekê Kurdan e, li rojavayî Kurdistanê dîkeve.

Du navêñ wê yên kevin hene, “Çiyayê Kurmênc” û “Çem”.

Dîroka wê vedigere sê hezar û pêncsed (3500) sal berî zayînê.

**Miletên Xor-Mîtanî li herêma Efrînê dest bi avakirina şaristanîyê kiriye.**

**“Kelha Xoros” an ku “Kelha Hûrî” navenda şaristaniyê bû, lê belê;**


hîmê pêşîn ê bajêr bi destê Fransîyan hate danîn, wan sala 1923'ê kevir jî çiyê birîn  
û sala 1927'ê seraya xwe, cihê ewlehîyê û birêveberîya serbazan ava kirine  
û tê da bi cih bûne.



Berî dagirkerîyê nêzîkî heftsed (700.000) mirov lê dijîyan, not û pênc ji sedî (95%) ji wan Kurd in, her wiha Ereb û Ermen lê niştecih bûbûn.

Li Efrînê du êstgehê navendî hene "Meydana Ekbes û Qetma".

Almanan ew di sala 1916'ê da ava kiriye.



Gelek kanî li wir têñ dîtin, ji wan:

- Kanîya Batmanê
- Kanîya Germikê
- Kanîya Ziravîkê
- Kanîya 'Eyn Darê
- Kanîya Basotê

### Navçeyêñ Efrînê

- Raco
- Şera
- Bilbilê
- Şîyê
- Mabeta
- Cindirêşê
- Şêrewa



Her wiha Bendava Meydanîkê gelekî bi navûdeng e û çîyayê herî bilind lê, çîyayê Bilbilê ye ku dirêjahîya wî 1270 metre ye.

Efrîn ne weke bajarêñ din ên Kurdistanê ye, ew bêtir bi navçeyêñ xwe, ne bi taxêñ xwe tê nasîn.



Dîrok

**Efrîn:** heştê û pênc ji sedî (85%) çiya ye û ya mayî deşt e.

Havîna wê hênik û bi nem e, zivistana wê jî sar e; berf û barana wê tim dibare. Jixwe biharan buhişt e û her dera wê şîn e, lê belê payiz li cem efrînîyan gelek bi nirx e, jî ber ew salê tevî kar dîkin û payizan kêfa xwe dîkin.

Ermenên Edena û Mêrsînê jî komkujiyê Osmanîyan revîn û berê xwe dan Efrînê, li wir jî xwe ra xanîyêne kelpîçî ava kirin û tê da rûniştin. Salên 1939'ê, gelek malbatêne Ereb ji Iskenderonê berê xwe dan Efrînê, lê bi cih bûn û dest bi bazarganîyê kir, helbet e rêjîmê ew han didan.

1939




1965




Sala 1958'ê du êlên Ereban ('Icêl û 'Imêrat) bi hev ketin û komeka mezin jî êla 'Imêratê revîyan Efrîn û navçeyêne wê û li wê derê bi cih bûn.

Rêjîma Sûriyayê jî di sala 1965'ê da di wexta Cemal Ebdeñasir da; gelek parçeyêne erd ên Cindirêşê bi navê wan qeyd kirin.




Bavê Selah  
Dengbêj

## Navdarên Efrînê



Merwan Berekat  
Nivîskar




Adîk Efrîn  
Muzîkjen




Mistefa Reşîd  
Lékoler



Şukran Bilal  
Nîgarkêş



'Elî Tico  
Dengbêj




Ebdelah Qereman  
Dîrokzan



'Ednan Dilbirîn  
Hunermend



Cemîl Horo  
Dengbêj



Xelîl Xemgîn  
Hunermend



Dr. Mihemed 'Elî 'Ebdo  
Nivîskar



31

Herfê aye estê.


8

Bivengî


23

Bêvengî yê


Embazêne bêrê ma Zerrya reyde zazakî nas bimusîme.




Awe / Av




Boran / Kevok



Cîtkar / Cotkar



Çeqel / Çeqel



Dare / Dar




Estore / Hesp



Êrûge / Încas




Fek / Dev




Golik / Golik




Her / Ker




Fistiqe / Fistiq



Îsot / Îsot




Jûje / Jîjo




Kesa / Kusî



Luge / Rovî



Mar / Mar



Nan / Nan




Por / Por




Pel / Pel



Qaze / Qaz




Roj / Roj




Saye / Sêv



Şêr / Şêr



Tirewe / Tivir



Ütfî / Ütfî




Tûnike / Bêrik



Verg / Gur



Werdege / Werdek



Xoz / Beraz



Yew / Yek



Zerence / Kew





Mamikên kurdî gelekî xweş in û hêja ne ku mirov wan  
ji ber bike û bi hevalên xwe ra jî bi par ve bike.

## Ha jî we ra hinên nû.

Wey xuhê xuhikê, her gavê  
xwelîyê bi serê xwe dadikê.  
Ew ci ye?

.....

Bi roj kaş e, bi şev laş e.  
Ew ci ye?

.....



# Zûgotinok

Ka vê zûgotinokê  
sê caran li dû hev  
bibêje!

- Şivanê mîr, şîrê bizina qîr da gizîrê mîr.
- Şivanê mîr, şîrê bizina qîr da gizîrê mîr.
- Şivanê mîr, şîrê bizina qîr da gizîrê mîr.

## Gotinêñ Pêşîyan












Her gotineka pêşîyan, gewherék e.

Divê em xweşik bala xwe bidinê û tim jî serbuhirîya wan fêr bibin.

“Ê ku zirta bike û kar neke; kerê nêr e.


Yê ku bêje û bike; mîr e,  
lê yê ku nebêje û bike; sêr e!”






# اللغة العربية

مرحباً أصدقائي! هيا لنتعلم معاً الشكل الصحيح لكتابة الحروف العربية.





Roj


Gelawêj, Zuhre yan jî Venus; gerestêrika dujem a herî mezin a Pergala Rojê ye. Gelawêj; ji her heşt geresitêrikên Pergalê ye, ya herî ronîdar e û di rêzê da; berî geresitêrika Erdê ye, piştî Tîrê ew a nêzîkî Rojê ye, lê belê **108 mîlyon km** dûrî wê ye û ji alîyê mezinbûn û pêkhatinê ve gelekî dişibe Erdê; volkan, çîya û newal lê hene, her wiha erdhejên volkanî jî lê diqewimin.

Venus navê Gelawêjê yê latînî ye, ku di demên berê da ji navê Xwedawenda bedewî, evîn, arazû û biserketinê ya Romanan hatiye birin.

Ji ber ku atmosfera wê gelekî tîr e, ew hejmareka mezin ji tîrêjên Rojê diteyisîne, lewma ronîdar e. Gelawêj mîna Tîr û Behramê geresitêrikeka axî ye.



Gelawêj her **224.65 rojan** carekê li dora Rojê digere. Li Venusê çîyayêñ madenî hene, ew çîya bi bi qesayeka zirîçi xemilandiye; wexta germahî bilind dîbe, ew dihele û dûman jê der dikeve. Li wir gelek volkanên çalak peyda dibin û rîjeyeka mezin a kirkutê (şixat) li esmanê wê heye, ji ber vê yekê caricaran volkanên wê diteqin.




Heger hûn bixwazin li ser **Gelawêjê** bijîn, wê giranîya laşê we ya li ser  
Erdê bigihe nîvê giranîyê dema hûn li jora **Gelawêjê** bin,  
lê hûn ê ji german bimirin, ji ber ew germahîya Rojê ya dîjwar  
di nav xwe da hilfîne.


Derdora wê bi ewreka giran a xazên jehirkirî pêça ye,  
lewma rê nade ku rûyê wê bixuye.



Volkanên Gelawêjê




Rêjeya germê



Ew gerestêrika herî germ a Pergala Rojê ye, lê cêwîya Erdê ye!

Dîtina Gelawêjê gelekî hêsan û xweş e, lê divê em berbangê şîyar bin an  
jî wexta roj here ava, çavê me li esman be,  
wê çaxê em dikarin wê bibînin.

Ji lew ra navêن “**Stêrika Sibehê**” yan jî “**Stêrika Evarê**” lê tê kirin.





Mirovan gerestêrika Gelawêjê ji mêt da nasiye. Berî 1600 B.Z; Babilan di têbînîyên xwe yên “Listeya Zehir Lano û Inlîl” da behsa wê kirine û navê “Eştar” ku Xwedawenda “Jin û Evînê” lê kirine. Yewnanan jî navê “Aphrodite” (Efrodêt) ku Xwedawenda Evînê ye lê kiriye.


Stîrnas dibêjin ku temenê gerestêrikê di navbera 300 û 600 milyon salî da ye.

Gelawêj gelekî germ e, rêjeya germê lê digihe  $449^\circ$  rêjeyî.

Ji ber ku zevîyê wê yê magnetîzî nîne; bayê wê gelekî xurt e.




Keştiyêñ gerdûnî yên ku gihane Gelawêje, gelek agahî li ser dane û dibêjin ku xazên Karbondioksît, Asîda Sulfuric û Nîtrojenê li wir têñ dîtin, lê ya herî giring ew e ku mirov nikare li wir bijî!






Gelo te berê Gelawêj nas dikir?!




Heger te nas dikir; ji me ra  
nivîsekê li ser Gelawêjê **bışîne**.

Rêya rast bibijêrin û alîkariya  
**ARA** bikin da ku bigihe Gelawêjê.







Eh




Simket




Nün




Mim




Rîş




Qof




Sadé



Fê



Tawo



Şin

لُّحْمَانٌ  
سَازِيَا


لُّحْمَانٌ سَازِيَا

Saziya Olaf Tawo ya Zimanê Siryanî




لیجان


**Şilomo hebrê. To yolifinan 'am hidodê şibîlo tîrîso leksîbito dîuswoso siryoyoso.**




Dated




Gome




bes




012




Hés




Zajíček




Waw




HE




omed



Kof



Yud



15

# Konê Reş :

Helbestvan û nivîskarê Kurd  
Konê Reş di 01'ê çileya sala  
1953'ê li gundê Doda ku girêdayî  
Qamişloya Rojavayê Kurdistanê  
ye hatiye dingayê.

Xwendina xwe ya seretayî û  
navîn li Qamişloyê û ya amadeyî  
jî li bajarê Hesekê qedandiye.




Sala 1978'ê dest bi nivîs û  
xwendina bi zimanê kurdî ya  
bi tîpêñ latînî kiriye.

Helbestê gelekî bala wî  
kişandiye, mamestegê wî jî  
Cegerxwîn bûye, her wiha ew  
li ser destê Celîlê Celîl fêri  
nivîsına pexşanê bûye.

Newroza sala 1989'ê kovareka çandî û folklorî bi navê "Gurzek Gul" der xistiye û  
her du mehan carekê; hejmarek jê dihate belavkirin.

Berhema wî ya pêşîn bi navê "Serpêhatîyên Mîran" sala 1991'ê hatiye çapkirin.  
Peywendîyeka ji nêzîk ve bi Mala Bedirxan û Apo Osman Sebrî ra danîye.  
Pişî serdanêñ wî ji Rewşen Bedirxan ra, sala 1992'ê bi destûra Wezareta Çandê  
ya Hikûmeta Sûrîyayê, wî pirtûka "Jîyana Mîr Celadet" çap kiriye.



**Li Bakur û Başûrê Kurdistanê, her wiha li gelek welatên dînyayê mîna “Misir, Tûnis, Tirkîya, Iraq, Urdin, Libnan, Almanya, Bilgariya û gelekên din gerîyaye û tevlî bi dehan mihricanan bûye.**

**Heya niha sih (30) pirtûk çê kirine. ji nav wan sê (3) dîwanên zarokan çap kirine.**

**Ji wan:**

**1- Berîya Mêrdînê**

**2- Sîpan û Jîn**

**3- Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan**

**4- Şagirtê Bedirxan Im**

**5- Helbestên Zarokan**

**6- Mîr Celadet Bedirxan**

**7- Dîroka Qamişloyê**

**“Hebûna me di zimanê me da ye û dîroka me di zimanê me da ye!”**

**Konê Reş**


**Ji kesên pêşîn bû ku lêkolîn li ser Mala Bedirxanîyan  
kiriye û gelek pirtûk derbarê wan nivîsiye.**



# Seyran

Wexta bihar tê, ez gelekî şad dibim. Kulîk vedibin, dar dibişkivin, kanî diteqin û her her şîn dibe.  
Baraneka hûr dibare û dilê her kesî xweş dike.

Ez jî her tim li bendî vê mehê me, ji ber hûn jî dizanin ev meha ger û seyranan e. Newroza me di vê mehê da ye; lewma ez gelekî jî biharê hez dikim.



Yekê gulanê: Cejna Karkaran e, em her sal di vê rojê da diçin seyranê û çavên xwe bi xweristê kil dikin. Evara wê bi lez ez bi Şivan ra axivîm û min jê ra got em ê herin ku derê, wî û malbata xwe jî amadekarîyên derketinê dikirin.  
Min jê ra got em ê herin Mizgeftê.

Mizgeft: bendaveka xweş e, nêzîkî bajarê Tirbespiyê ye. Şivan got ku wan jî plan kiriye ku sibe li wir bin, wexta min wiha bihîst, erdê nema ez girtim, min nema bawer dikir kengî bibe sibe û em herin Mizgeftê û ez û Şivan ji xwe ra fêr bilîzin û bigerin.



Bû sibeh, me amadekarîyêñ xwe kirin, firxên xwe xistin tirimpêlê  
û bi rê ketin, gava ez nêzîkî wir bûn, min erda şîn nedît!  
EZ gelekî xemgîn bûn.

Mixabin vê salê baran gelekî kêm bariye, rûyê gîya xemgîn bû, lê  
tişta ez gelekî bêzar kirim ew e ku geleş û qirêj li her derê  
belawela bû. Ez pûnijîm û di dilê xwe da got: Çima kesên têñ vir  
piştî ku seyrana xwe xilas dîkin, gemara xwe li dû xwe dihêlin!  
Min çi qas di serê xwe da bir û anî, min kir nekir, min fêm nekir  
çima kesên li vir jîngeh neparastin! Hema jî nişkan ve, çavêñ min  
li Şivan ket. Ew jî bêzar bûbû, hate cem min û got: "Aral! Ka em  
dest pê bikin û vê geleşê kom bikim."

Min serê xwe hejand û erêbûna xwe nîşan da.  
Piştî du saetan her dera me xwestî, paqîj bûbû  
û êdî aram me karibû li erdê rûnin û yarîyêñ  
xwe bikin. Erê em di paqîkirina wir da  
westîyan, lê hêja ye ku çavê me her derê  
xweşik û şîn bibîne.  
Welatê me hêja ye ku her paqîj bimîne.





# سۆرانى

- ٣٤ پىتى سۆرانى  
٧ پىتى دەنگدار  
٢٧ پىتى بىدەنگ

هاورىيان وەرن لە گەل ھيوا سۆرانى فير بىين.



# TEMBÛR

Ji sazên herî dêrîn a gelên Arî ye.

Li gor lêkoleran, temenê wê digihe şeş hezar sal (6000) berîya niha.


Li seranserî Kurdistanê jî ev saz bi nav û formên ji hev cuda tê jenîn  
û bikaranîn; mîna “Tembûr, Temûre, Tenbûr û Temîre.”  
Tembûr jî alîyê dirêjbûnê da, bi gelek awayêن cuda tê çêkrin, lê bi  
giştî ji 85 cm heya bi 90 cm ye.

Tembûr jî kasik, destik, sefhe, têlgir, pira destik,  
pira sefhê û 3 yan 4 kokan pêk tê.

Kasika wê weke hirmîyê (karçikê)  
ye, destikê wê dirêj û  
ji 12 heya 14 perdeyan pêk tê, di  
navbera wan da bi qasî perdeyekî  
yan nîv perde heye.

**Derwêş Elî Çengî,  
helbestvan û muzîknasê sedsala 16'ê ye,  
dide xuyakirin ku Tembûr jî du peyvên  
Yonanî pêk hafiye: "tem" an ku dil û  
"bûre" bi wateya selixandinê, ku dîbe  
"Selixandina dil".**

**Ev amûr li piranîya  
herêmên Kurdan;  
amûra bingehîn û  
herî naskirî ya Kurdi  
tê naskirin.**




قالاو

فيل

غوبار

ده عبا



مله

مهله کور

گاوه

کته




ھوريهٰ ل

وهره

نه چير

ماساو



ھهنج

ڦه رگ

مهيمون



شیر

يه کانه

که رگه

- پېتى ھەورامى ٣٥  
پېتى دەنگدار ٧  
پېتى بىدەنگ ٢٨

# ھەورامى

ھەمەراكىم بىدى چنى شاھۆى ھەورامى فيرى بىمى.





# Gurê Bêhiş



Wextek ji wextan; koçer li zozanan bûn. Ji zozanan daketin deştê, li wir gayekê jar li dewsa xwe hiştin. Gurek rastî wî gayî tê.

"Gayo, ez ê te bixwim."



"Malava! Tu dîn bûyî? Tu yê çawa min bixwî? Ezbenî! Min li zozanan bigerîne, çayîra biçêrîne, wiha ez ê qelew bibim, paşê min bixwe."

"Gayo, êdî wexta xwarina te ye."



"Gurê ezîz, te ev werîsê di qirika min da dîtiye?"



"Erê!"

"Serê xwe derbasî werîs bike, heger derbas bû nexwe hîn jar im, ku derbas nebû nexwe wextê xwarina min hatiye û qelew bûme."

"Li ser çevêن min!"



Gur serê xwe derbasî werîs kir, serê wî derbas bû. Wexta derbas bû, ga da lotikan, serê gur çû û hat, çû û hat û gêjomêjo bû. Wexta serê gur ji werîs der ket, bêhiş ketibû, ga jî reviyabû çûbû. Gur rabû bi rê ket û çû zozaneka din. Rastî hespekê jar, kulek û piştkul hat.

"Hespo! Ez ê te bixwim!"

"Bêhişo! Tu yê çawa min bixwî? Ser min çerm e, hemû hestû me. Min li çiya, zozan û mîrgan bîçêrîne, ez ê qelew bibim, paşê goştê min bixwe."

Gur hesp çêrand.  
Hesp geleki qelew bû.

"Hespo, êdî dema  
xwarina te hatiye."

"Mîzek di bin lingê min da ye,  
heger bi te ra hate kişandin  
nexwe ez qelew bûme, heger te  
nekişand nexwe ez jar im."

Hespî lingê xwe  
bilind kir, gur xwe  
avête bizimar, hespî  
pehînek lê da. Gur  
li erdê ket. Hesp  
revî, dûr çû.



"Êdî wextê derketina gîyayê şîrîn e. Divê em  
helez û hewşanê bixwin da ku goştê me tama  
wê xweş bibe û wexta xwarina me bê."



Gur karikên xwe  
birin mîrga  
gîyayêñ xweş.  
Karikan helez  
xwar, hewşan  
xwar.

"Ka em herine ser avê, em avê  
vexwin, paşê me bixwe."

"Êdî ez ê  
we bixwim."



"Guro! Tu hinekî ji me ra li zirinê bixe, em  
ê jî li dora te herin û werin, da ku tama  
goştê me bi te xweş were."



Gur li zirinê da, karikan ji xwe dîlan kir. Gur bi zirina  
xwe ra germ bûbû, wextek derbas bû, lê nihêrî ku çi  
bibîne! Karik reviyane, çûne gihane kerîyê pêz.

"Min xwe da li ber lotikan, min nalbendî kir,  
ez bûm zirineçî, lewma jî her tişt ji destê min  
çû, çi bê serê min di heqê min da ye!"



Ji wê rojê ve gur êdî bawariya xwe bi  
kesî neanî. Çi pêrgî wî dihat, lepên  
xwe diavêtê û dixwar..



## ARA ACADEMY

Sciences - Technology



Akademîya me jî çê bû! Ez pê gelekî şa me.  
Akademîya me warê pişkivîna hêvîyan e.  
Akademî; yek ji projeyên Ararat Groupê ya bipêşxistin û geşepêdanê ye.  
Ew li bajarê Qamişloyê ye.

Gelekî nêzîk e û kengî ez bixwazim dikarim herim û hevalên xwe lê bibînim.  
Wexta ez çûm û min hevalên xwe dît, wan gelekî behsa akademîyê ji min ra kir û  
kêfxwesîya xwe anîn zimên.



Digotin ku ew li ser rîbazeka perwerdehî tagbet perwerdeyê dibînin û van wanegan distînin:

- Bingehê kompîturê (Hard ware-Soft ware).
- Birêvebirina kompîturan li ser bernâneyên Microsoft Office (Word-Excel-Access-PowerPoint).
- Design û montaj: Bernâneyên Adobe (Photoshop-After Effects-Premiere-InDesign).
- Bernameçêkirin û bingeha agahîyan (Database).
- Girover û kontrolkerên elektronîk (Arduino-Raspberry Pi).
- Bîrkari.
- Zimanê ingîlîzî, kurdî û erebî.



Dê plana perwerdehîyê li ser du qonaxan dabeşkirî be (amadekerî û pisporî).

Xwendekarê akademîyê: zarokên malbatêن qurbanî û zîyandîtiyêن ji şerê Sûriyeyê ne.

Armanca akademîyê ew e ku ev zarok karîbin civakê bi pêş da bixin û jê ra bibin pişt û hêz her wiha di alyê teknolojîgaya da xwe xurttir bixin û bandorê li takekes û civakê bikin.



12.Sal

Cihan Kadoz



14.Sal

Rêdar Es'ed



12.Sal

Umer Selman



12.Sal

Azad Mihemed



12.Sal

Beşîr Osman



49




13.Sal

Şehid Silêman





# Şahsiwarê Robotan Îsmayîlê Cizîrî



Elcizîrî yan jî Bedî'ûzeman Ebûl'iz  
Îsmayîlê Rezazê Cizîrî.

Ew sala 1153'ê li Şîrnexa Cizîra Botan  
hatiye dinê û sala 1233'ê koça dawî  
kirîye.

Îsmayîlê Cizîrî; dahêner, bîrkariyar, endazyar û fizîknasekê Kurd e.  
Wî bingeha zanista robot û sîbernetîkê çê kirîye.

Ew bi pirtûka xwe ya bi navê "Elkîtab Fî Me'rîfet Elhîyel Elhendesiye" yan ku  
"Pirtûka Zanîna Xapên Endezyarîyê" navdar e.

Wî ev pirtûk dî sala 1206'ê da nivîsiye  
û tê da behsa çekirina 50 amûrên  
mekanîkî dîke. Ev amûr tev nîgarên  
wan dî pirtûkê da fêñ dîtin.

Ew endezyarê dema xwe yê herî  
mezin bû; pirtûka wî jî gelekî hezkirî  
bû.

Ev pirtûka em behsê dikin, "15" çapêñ  
wê li gelek pirtûkxaneyê cîhanê  
hene.



Îsmayîlê Cizîrî perwerdeya xwe ya pêşî li  
"Medreseyêñ Kurdi yêñ Klasîk" dest pê  
kirîye.

Li van medreseyan bêhtir li ser fizîk û  
sîbernetîkê wane standige, baş şareza  
bûye, kîfişkirin kirine û xisitine bin  
xizmeta mirovahîyê.



**Arduino (Ardiwîno): Tabeleyeka bipêşxistinê ya elektronîk e.**

Jî çivaneyeka elektronîk û jêdervekirî, her wiha kontrolkerek ku dî rêya kompîturê tê bernamekirin pêk tê.

Arduino ji bo dîzayna projeyên elektronîk ên çalak an jî projeyên ku avakirina hestîyarekên ekolojîk ên cûrbicûr mîna rêjeyên germê, ba, ronahî û fişarê tê bi kar anîn.

Hûn dikarin Arduino bi gelek bernameyên kompîturê ve girê bidin, ew di bernamekirina xwe da; xwe dispêre zimanê bernemeçêkirinê yê jêdervekirî (processing) û kodêن wê yêng taybet mînayî zimanê "C" ne ku hêsantrîn zimanê bernameçêkirinê di nivîsandina bernameyên kontrolkeran da ye.



Hin lêkolînan çespandin ku parçeyên Arduino derbasekek giring e ku bi rêya wê mirov dikare rêgezên zanista kompîturê binase, ne tenê ew, lê endezgarîya kehreba û mîkanîkê, pê ra jî pîşe û huner; hemû bi hev ra.





QR'a kovarê



QR'ê scan bike



Li bende be!



Kovarê bixwîne.

**QR'ê bi kamerayêñ telefonêñ xwe scan bikin û kovara  
me bi forma PDF'ê daxînin.**



**ara**  
**MED PRO**  
[www.arasat.online](http://www.arasat.online)



Kanala Ara Zarok  
di nav rêzekanalên Arasatê da ye.  
Gelo hûn lê temâse dikin?




Serdana me bikin.  
Qamişlo - Kolana Wihdê - Kêleka MTN





Celadet Ali Bedirxan  
1893 - 1951



Em hejmara xwe ya sêyem di salvegera notî “90” ya weşandina Kovara Hawarê da  
ku Roja Zimanê Kurdi ye diweşînin û dîyarî gîyanê Mîr Celadet Ali Bedirxan dîkin.



Ara Zarok; çêja jîgîna zarokên Kurdan e!